



Zanyarî ji raspêran re (welî emir) di derbarê vîrosa korona de.

Em di şaredarî ya Karlshamn de didin pey şîret û zanyarî yên kû derdikevin ji alî yê rêveberîya tenduristî gelêrî giştî û zanyarî yên kû hene li ser malpera wê ya internêtê ew jî tim nûjen dibin.

Ta wek anha herêma Blekinge nayê hijmartin wek herêmek metirsîdar, heya îro çalakî yên me li dibistanên bengehî (1-9) berdewamin.

Tiştêk normale ew kesên nexweş li mal bi mînin û ew kesên saxlem li dibistanê bin ev gotin ji şagirt û mamostan re ye.

Em ji raspêran (welî emir) di xwazin hûn û zarokên xwe fêrî pêwistî yên xweparêzîyê di malêde, li binê vê rûpelê meyzeke, ew jî jiber ne belavbûna vî veyrûsî ye.

Ew têkstê li jêr vê rûpelê hatîtiye birîn ji têkstên kû hatine di rûpela rêveberî ya tenduristî gelêrî, em ji hemîyan daxwaz dikin bidi pey.

Ji şagirt û karmendên dibistanê tê xwestin agadarbin û hişyarbin eger dîtî wek ta kuxuk yan henasa bi zorê (bihinçikandin) li wan xuyakir gerege li mal bimînin. Ev jî jibo sînorkirina vî nexweşîyê. Divabe mirov hişyarbe tiştine biçûk jî bi tere çêbibin wek şewata qirikê herikandina bêvilê (poz) û êşandina laş û kabokan ji bilî kû mirov çûbe seredana welatekî din.

wek tê xwestin ji şagirt û karmendên dibistanan tê xwestin û ji her kesekî ji komelgehê kû hesta wî heye bi van êşan, divabe dû rojan li malbe berî kû here dibistanê.

Mecbûrbûna xwendinê tê bi karanîn li ser hemî şagirtan yên dibistanên bengehî ji sinifê 1 heya 9 û sîstemên xwendinê mîna wan. Li gor nêrîna rêveberîya tenduristî gelêrî heya anha nabe kesek saxlem li mal rûnê û neçê dibistana xwe, li gor pirinsîpa vedana nexweşîyê sedem nîne şagirtêk saxlem li mal rûnê û neçê dibistana xwe.

Ev nêrîn hatîtiye avakirin li ser zanistî yên nexweşîyên mîna înflewnza ya kû bi heman şêwe belavdibe mîna nexweşîya kovîd19. Li gor zanistîya me di derbarê belavbûna vî nexweşîyê rola girtina dibistana kême eger ne ji binî tunebe li ser belavbûnê, li gor nêrîneke din dibistan rolek mezin di lîze di komelgehê de.

Hinek şîret û zanyarîyên giştî ji bo xweparastina belavbûna nexweşîyên sîngê:

- Dûrketin ji destdana ro û çavan.
- Dûrketina ji kesên nexweş.
- Destên xwe baş bi şo bi sabûn û ava germ berî xwarinê û piştî xwarinê û piştî çûna destavê. Bi karanîna sipîrto (Alcogel) başe eger derfeta şuştinê tunebe.
- Bi kuxwe û bi pişke di nav zendê xwede piştî tewandinê yan jî di nav desmalkê de ji bo ne belavbûnê û paqijîya destan.
- Tim bînin bîra zarok û şagirtan xweparastin û ne belavbûna nexweşîyê hemî rojan.

Tû di kare zanyarî yên nû bi şopîne li ser malpera internêtê ya rêveberîya tenduristî gelêrî.

folkhalsomyndigheten.se

Digel silavên min ez **Sofia Olsson.**
Rêvebera katî ya dibistanên bengehî.